## Sindoqa endametiyê

Armanca sindoqa endametiyê ev e ku hemû zarok û ciwanên ku navnîşana wan li Porsgrunnê ye, şansê wan hebe ku beşdarî herî kêm çalakiyeke dema rihetiyê bibin her hefte an bi awayekî muntezem. Serîlêdanên daxwazkirinê berdewam têne çareserkirin heta ku sindoq vala bibe.

**Kî dikare daxwaznameyê bide?**

Grûpa aramanc zarok û ciwanên di navbera 4–20 salan de ne, ku ji ber rewşa aborî ya malbatê hewceyî alîkariya aborî ne da ku karibin pereyên beşdarbûna di çalakiyan de bidin.

Dayik û bav ji bo zarokên xwe daxwaznameyê rêdikin, lê ciwanên ku 16 sal temam kirine dikarin bi xwe daxwaznameyê rêkin. Eger ji bo gelek zarokan daxwaz were kirin, divê ji bo her zarokekê daxwaznameyeke cuda were dayin.

**Mirov dikare ji bo çi daxwaza alîkariyê bike?**

Sindoqa endametiyê alîkariyê dide da ku zarok û genc bikaribin di çalakiyên dema valahiyê yên sabit de beşdar bibin. Mînak: diravên endametiyê, xercên beşdarbûnê, xercên meşqkirinê (temrînê), xercên kûrsan, lîsêns, û beşdarbûn di kampan, dibistana havînê, kombûn, kûpan, semînaran, geştan, tûrneyan û çalakiyan mîna wan de. (Alîkarî ji bo amûran nayê dayîn)

Her zarokek/ciwanek dikare di nava salekê de bi tevahî xercên heta 4000 kr wergre.

Çalakî dikarin ji aliyê dezgehên ehlî, giştî an rêxistinên dilxwazî ve werin pêşkêş kirin.

**Çawa daxwazname tê pêşkêş kirin?**

Forma daxwaznamê a elektronîkî

Daxwazname di betlaneya cejna hilketina pêxember Îssa (påske), cejna krîsmasê, an jî di betlaneya dibistanan di havînê de nayên çareserkirin.

**Heke hewcehiya te bi alîkariyê hebe bo rêkirina daxwaznameyê**
Ji boyî alîkariyê bo tijîkirina forma elektronîkî , amûra Digihjelpê li nivîsgeha xizmetguzariyê (servicekontor) an jî li pirtûkxaneyê bikar bîne.

**AGAHIYEKE GIRÎNG**
Divê di fatûreya çalakiya ku tu dixwazî alîkariyê ji bo wê bistînî, hejmara faturê hebe û divê ew wekî pêvek bi daxwaznameyê re were şandin.

Daxwaznameyên ku ev pêvek bi wan re tune nayên çareserkirin.

Eger daxwazname were qebûlkirin, dê şaredarî ji dêla te ve pereyan bide û tu ê bersivê bi rêya Altinn.no bistînî.

Eger te pereyê fatûreyê dabin, dê şaredarî wan pereyan li te venegerînî.

Eger daxwazname têkildar be bi navenda meşqkirinê ve ku mirov dravên wê mehane dide?
Têkiliyê bi navenda meşqkirinê re bike û bipirse ka tu dikarî yek fatureyê ji bo «hewqas» meh bi hev re bistînî.

Em bala we dikşînin ser ku yane/komele wê bikaribin bibînin ku drav ji aliyê Şaredariya Porsgrunnê ve hatine dayîn.

**Pirsên te hene di derbara pergala daxwazkirinê de?**

Pirsên din dikarin liser vê navnîşanê werin şandin:
kontingentkassa@porsgrunn.kommune.no

Beşa çalakiyên dema rihetiyê (Fritidsavdelingen) – Jo bo çalakiyên û çandeke hewîner

Pergal ji hêla **Porsgrunn Club Kiwanis** û **Bufdir** ve tê piştgirî kirin.